Kurmançî/Kurmanji

# Mafên we yên di derbarê pêvajoya îltîcakirinê de



Agahî ji bo zarok û ciwanan

Di vê buroşûrê de hûn ê vana hînbibin:

- ✓ Hûn dikarin ji kuderê alîkari werbigirin
- ✓ Mafên we çi ne
- ✓ Li Îsvîçreyê prosedura îltîcayê çewa pêk tê?
- ✓ Mulaqat çi ye?
- ✓ Hûn dikarin ji kuderê tevlî prosedura îltîcayê bibin?

## Wergirtina alîkariyê

Rizgarkirin: **144**
Polîs: **117**



**Heke hûn bi strês bin an jî Pirsgirêkên we hebin:**

- Pro Juventute (Yekîneya Ciwanan): 147
- Di warê vegirtina qûnaxiyê de refaqetkar
- Mamoste

### Nûnerê min ê zagonî/ Kesê Pêbawer (Mûtemed)

Nav: ______________________

Nimroya Telefonê: ______________________

Di derheqê pêvajoya îltîcayê de ji bo danezanên dorfireh:

unicef.ch/ asylumprocedure

unicef for every child

mmi

UNICEF Switzerland and Liechtenstein and Marie Meierhofer Institute for the Child (MMI), 2024

## Mavê zarokan di pêvajoyên îltîcayê de jî derbasbar e

Mafê we heye ji bo xwe baş bihisînin û tendurust bin.



Hûn xwedîmaf in ku hûn çi difikirin û pkêdiviya we bi çi heye bibêjin.



Tişta ji bo we girîng e di her mijarê de hûn xwedîmafê agahdarbûnê ne.



Hûn xwedîmafê destek û perwe-degirtinê ne.



Mafên Zarokan ji bo hemû zarokên temenê wan ta 18 saliyê ji bo zarok û ciwanan derbasbar e.

Dewleta Îsvîçre, rayedar, polîs û hemû kesên gihîştî zarok û ciwan divê ji mafên zarokan re rêzdar bin.

Piştî rojbûna 18. Sal hîn bêhtiriya we mafê mirovan ji bo we û hemû kesên gihîştî derbasbariya wê berdewam dike.


Heke ji mafên we re rêz neyê girtin: Ev yek nayê pejirandin. **Di derbarê vê yekê de bi kesekî re biaxivin!**

Di derbarê mafên me de Ji bo agahiyên hîn bêhtir

unicef.ch/ childrights



# Pêvajoya îltîcayê çewa pêk tê?




## 1 Navenda serîlêdana îltîcayê



- Devkî an jî nivîskî
- Di navendekî îltîcayê ya federal de (BAZ)
- Di kontrola tixûb a Îsvîçre de

## 2 Asta amadekariyê

- Qeydkirina kontrola daneyên takekesî, pencemor û hwd.
- Di derbarê rotaya revê de lêpirsîna pêşin
- Nûnerê zagonî yê bêdirav/Tayînkirina kesê pêbawer



**Nûnerê Zagonî/kesê pêbawer**

- Agahiyên di derbarê pêvajoya îltîcayê de alîkarî.
- Di pêvajoya îltîcayê de alîkarî
- Amadehiya ji bo mulaqatê
- Di mulaqatê de hevaltîkirin

## 3 Mulaqat

**Mulaqat** hevdîtinek ji bo xebatkarên SEMê tê kirin e. Nûnerên we yên zagonî/kesê pêbawer jî li wir amade ye. Digel vê yekê nûnerê we yê zagonî/veşartiyê we di navde ye

**SEM** (Rayedarê ji Penaberiyê Berpirsiyar) Di derheqê serîlêdanên îltîcayê de meqamên Îsvîçre yên biryar didin in.

Di **mulaqatê** de sedemêmên îltîcayê, ango reva we ji bo çi pêwîst bûye tê nîqaşkirin. Ev yek di heman deme de rewşa we ya heyî û yên din.

Di mulaqatê de tiştên tên gotin bi **qeydnameyekî** tê qeydkirin.

Îfadeyên zarok û ciwanan ji bo piştrastkirina sedemên îltîcakirina dê û bavan nayê bikaranîn.




**Mulaqata min**

Dîrok û Saet: ____________________

____________________

Cih: ____________________

## 4 Biryara îltîcayê

Rayedarê ji Penaberiyê Berpirsiyar (SEM) biryara îltîcayê dide.



**Biryara erênî**

Hûn dikarin li Îsvîçreyê bimînin û mafê îltîcayê werbigirin.



**Biryara neyînî**

Tu neçar î ji Îsvîçreyê derbikevî.

**Pejirandina demkî**

Heke welatê hûn ê biçinê bi ewle nînbe ta ku rewşa xeterî derbas bibe li Îsvîçreyê hûn bleiben dikarin bimînin.

**Prosedura Dûblînê**

Prosedura îltîcayê divê li welatekî din yê Awropa pêk were.

**Îtîraz**

Heke hûn biryarê nepejirînin Hûn dikarin şikayeta xwe ragihînin Dadgeha Îdareya Federal. Nûnerê Zagonî/Mûtemedê rayedar dikare alîkariya te bike.



**Tespîta Temen**

Di hin rewşan de ji bo tespîta temen muayeneya tibî tê kirin.